
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1183 | 3-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218


# Pirtûka “Ez Ayşe Şan im” hat derxistin




Komeleya Kultûra Kurdî pirtûkek bi navê “Ez Ayşe Şan im” ku li ser jiyan û xebata hunermenda Kurd a nemir Ayşe Şan dinirxîne derxist. Bi armanca parastina kultûr û çanda Kurdî, Komeleya Kultûra Kurdî pirtûkek bi navê “Ez Ayşe Şan im” derxist. Pirtûk li ser jiyan û xebata hunermenda Kurd a nemir Ayşe Şan e.

Ev gav, beşek ji însiyatîfa belgekirin û xelatkirina kesên di dîroka hunera Kurdî de xwedî rol e. Komeleyê diyar kir ku di pirtûkê de hûrgiliyên jiyana hunermenda nemir Ayşe Şan û agahiyên derbarê xebata wê ya hunerî de û pêşengtiya wê di stranbêjiya Kurdî de hatine behskirin. Her wiha di pirtûkê de wêne û belgeyên girêdayî jiyana hunermenda nemir hene. Pirtûk bi tîpên Kurdî yên Latînî hatiye nivîsandin û ji aliyê Zeyneb Yaş û Hilmî Akyol ve hatiye amadekirin. Ayşe Şan li bajarê Amedê yê Bakurê Kurdistanê di 1938’an de ji dayik bûye, lê bi xwe ji bajarê Erziromê ye. Malbata wê ji 6 ferdan pêk tê (3 keç û xortek). Ew di malê de ya mezin e. Ayşe Şan piştî ku behreya stranbêjiyê di xwe de dît, ji ber adet û kevneşopiyên malbatê zehmetî kişandin. Lê tevî wê jî, wê kasêteke stranan di 15 saliya xwe de tomar kir û ji vir de jiyana wê ya hunerî dest pê kir.

Ayşe Şan di 18’ê Çileya 1996’an de li Îzmîrê di encama nexweşiya kanserê de jiyana xwe ji dest da û li pey xwe mîraseke hunerî ya giranbuha ji nifşên din re hişt.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Şîrhelal e:**
- Ji bo dêbavên xwe qenc e.
- Malê heram naxwe; mirovekî qenc e.
- Durist e; bawerî pê tê; ti kesî naxapîne; qenc e; bêbextiyan li ti kesî nake; dostê dostê xwe ye.

**Şîrê xwe helal kir:**
- Mirovekî qenc jê derket.

**Ti kes jê tehl nabe:**
- Mirovekî pir baş e; ti kes jê naêşe.

**Xwe şkandiye:**
- Têkiliyên xwe ji xweşiyên dinyayê biriye, sirf xizmeta dîn dike.
(Di dînê Êzdayî de yên ti karî ji xwe re nakin, nazewicin, sirf xizmeta Leleşê dikin ji wan re tê gotin)

**LI SER BANDORÊ**

**Aşê avekê pê digeriya:**
- Gotinên pir giran, pir bibandor gotin.

**Ava çeman disekine/avên çeman disekirin:**
-Li cem pir biqîmet e; cihê wî ji yê her kesî cudatir e; ti kes ji gotina wî dernakeve; pir jê tê heskirin; pir jêhatî ye; pir dewlemend e; pir mêrxas e; pir merd e; pir camêr e.

**Av pê germ dibe:**
- Bandora wî heye; dikare bike; bikêr e;

**Çavê mirov jê têr dibe:**
- Dizane biaxive; gotinên wî biwate ne.
Çav dixwe.
- Eger çav xwarinekê neecibîne, mirov nikare bixwe.

**Çavşewat e:**
- Awirên wê dijwar in.

**Derba koran e:**
- Derba wî pir dijwar e.

**Dest didize ling dilerize:**
- Her tiş bandorê li tişteke din dike.
-Azad mêrek kuştibû pismamê wî ditirsiya. Gotin; dest didize ling dilerize.

**Didanek e:**
- Di nava êla xwe de xuya ye; bi gotina wî tê kirin.

**Gustîla destê min e:**
- Ji gotina min dernakeve.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Li Bexdayê pirtûkxaneyek ji aliyê jinan ve hat vekirin

Du bijîşkên jin pirtûkxaneya bi navê “Etras We Ekser” a yekem li paytexta Iraq Bexdayê vekirin. Piraniya kesên serdana wê dikin jin in ji ber ku ev pirtûkxane ji aliyê jinan ve tê birêvebirin û balê dikşîne ser xwe. Du jinên Iraqî pirtûkxaneya “Etras We Ekser” vekirin. Pirtûkên tê de yên fikrî, çîrok, helbest, huner, felsefe û heta pirtûkên zarokan hene.

10’ê Gulana 2024’an du jinên Iraqî Ban El Rikabî û Zeyneb El-Rikabî pirtûkxaneya bi navê “Etras We Ekser” li herêma El-Mensûr El-Dawûdî li navenda paytexta Bexdayê vekirin. Di her koşeyekê vê pirtûkxaneyê de hunera jinan xuya dike, ji dîzayna wê bigre heta dekor û çirayên wê, pirtûkxane bi rengekî lihevhatî hatiye organîzekirin ku xwîner bi awayekî hêsan bikaribe bikar bîne. Her wiha yek ji refan ji bo berhemên bavê wan Ebdul Xaliq El Rikabî hatiye veqetandin. Di destpêka wê de jî berhema “Etras El-Kelam” heye, di pirtûkxaneyê de atmosferek guncaw a xwendinê heye ku pê re mûzîk heye her wiha nebatên siyê jî ku hîn zêdetir atmosfera rehetiya derûnî çêdikin hene.

Pirtûkxane ji du beşan pêk tê, beşa kesan ji 18 salan mezintir û beşa zarokan heye. Deriyê sereke yê ketina pirtûkxaneyê bi wêneyên mezinên wêjevan û helbestvanên Iraqî hatiye xemilandin. Kafeteryayek biçûk ji bo xizmeta xwîneran jî heye, xwîner ji saet 11’yê nîvroyê heta 11’ê êvarê dikarin serdana wê bikin.

**‘Em ji maleke ku dîwarên wê hemû refên pirtûkan bûn de mezin bûn’**

Der barê fikra projeyê de Ban El Rikabî dibêje: “Gelekî normal e fikra vekirina pirtûkxaneyê çêbibe ji ber bavê min nivîskar û xwîner bû, em ji maleke ku dîwarên wê hemû pirtûkên refên mezin bûn. Rewşenbîr û wêjevanên heval û dostên bavê min lê bûn. amade dibûn civîn li mala me çêdibûn .”



**‘Zarokên me di atmosfera niha de ji pirtûkan dûr in’**

Zeyneb El-Rikabî teqez kir ku tişta herî zêde bû sedemê vê pirtûkxaneyê vekin ji bo hişyarkirina nifşê nû ye û got: “Zarokên me atmosfera ku em tê de jiyan nedîtin, ji girîngtirîn pirtûkên ji bo me. Me pirtûka hezar û şevek û jinên biçûk û her wekî din xwendine. Em hewl didin careke din nifşê nû vegerînin cîhana xwendin û pirtûkan li şûna ku bi torên medyaya dîjîtal re têkildar bin.” Her wiha diyar kir ku ji bo nirxandina pirtûkan dixwazin xebata xwe berfirehtir bikin.

**Pirtûkên ku zêde hatine xwendin girtin pirtûkxaneyê**

Ban El-Rikabî jî teqez kir ku hilbijartina pirtûkên ku xistine pirtûkxaneyê ne hêsan bûye, hemû bi riya beşdarbûna wê di 3 pêşangehên ku li Bexdayê çêbûne hatine hilbijartin. Wê pirtûkên ku herî zêde ji aliyê kesên xwîner ve hatine xwendin her wiha yên herî zêde hatine firotin û di pirtûkxaneyên kolana El-Muteebî de tune ne hilbijartiye.

**‘Kesên tên serdana pirtûkxaneyê hemû jin in’**

Bana El-Rikabî teqez kir ku kesên serdana pirtûkxaneyê dikin hemû jin in û got: “Piştî ku jin hîn bûn pirtûkxane ji aliyê jinan ve tê birêvebirin rehet bûn. Bi taybetî keçên ciwan, tevî ku pirtûkxaneyên jinan tineye jî lê belê dema jin dikin mêr jî, dixwînin hinekî matmayî dimînin lê ji rêveberên wê yên jin hinekî nerehetiya jinan kêm dibe.

**‘Em dixwazin pirtûkxaneya xwe bikin cihê çalakiyên çandî’**

Der barê sîstema pirtûkxanyê de Ban El-Rikabî got: “Fikra pirtûkxaneya sereke “Big Store” bû ango firoşgeha pirtûkan, zêdetirî nîvê pirtûkên heyî ji firotinê re ne. Ango pirtûkxaneyê firotin û xwendina di hundirê pirtûkxaneyê de ye.

**‘Jinên Iraqî pêkhatî ne dikarin gelek tiştan bi hev re bikin’**

Ban El-Rikabî diyar kir ku zehmetiya duyem jî ew e ku jin in û gelek tişt ji wan tên xwestin. Ji ber li gel karê xwe zarokên wan hene û divê li wan miqate bin û got: “Lê belê jinên Iraqî dikarin van hemûyan bi hev re bikin. Dayika min ji bo vê yekê mînak e. Mamoste bû ew bavê min dikir. Bavê min ê ku ji ber qezayek nexweş ketibû û liv û tevgera wî kêm bû tiştek bikira lê dayika min heta tiştên ku bavê min dixwest binivîsîne guhdarî dikir û dinivîsand. Dayika 3 keçan e û mamoste ye û îro roj ez li pey şopa dayika xwe dimeşim.”

**‘Gelek nivîskar û wêjevan hatin serdana pirtûkxaneyê’**

Der û barê piştgirîya pêwendîdar bi çand û wêjeyê re jî got ku tevî demek kin di ser vekirina pirtûkxaneyê re derbas bûye jî bala gelek kesan dikşîne û got: “Şandeyek ji yekîtiya giştî ya wêjevan û nivîskarên Iraqê serdana me kir û piştgirî da projeya me. Her wiha xwestin çalakiyan li vê derê li dar bixin. Gelek nivîskar û wêjevanan jî serdana pirtûkxaneyê kirin û diyar kirin ku ew amade ne pêşkêş bikin. Ji bo projeya wan bi ser bikeve, berhemên xwe jî li pirtûkxaneyê ji bo xwendinê danîn. Yek ji wan jî dr. Rexed El-Sihêl a xwediya xelata afirandinê ya Iraqê ye û di warê çîrokê de sala 2023’an de xelat girtiye.”**NÛJINHA**

## bi kamîreya Hemza Sêvo



## Ramanê Rêber Apo îlham da cîhanê

Hevseroka Kongreya Civakên Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê Zubeyda Zumrut diyar kir ku heta azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were wê pêngava azadiyê berdewam bike û got, “Ramanê Rêber Apo Îlham daye tevahiya cîhanê.”**R-5**



## Çarçoveya têgînî...Qirkirin

Qirkirin weke dewama asîmîlasyonê ye, gel, hindikayî, her cure komên dînî, mezhebî û etnîk ên bi asîmîlasyonê nikaribin bi wan, dixwazin bi rêya fizîkî û çandî wan bi temamî tesfiye bikin û wan têk bibin.**R-4**




Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1183 | 3-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S


# PÊKHATEYÊN CIZÎRÊ; RÊBER APO NÛNER Û HÊVIYA GELAN E

Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyeyê di çarçoveya pêngava cîhanî de ku 10`ê Cotmeha 2023`yan bi dirûşma “Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareserî” hatibû destpêkirin, piştî serlêdana Partiyên Siyasî, di 29’ê Gulana 2024’an de dest bi serlêdana pêkhatiyên kantona Cizîrê kir. Di serlêdanan de pêkhateyên herêmê diyar kirin ku tecrîda li ser Rêber Apo sûcekî dijmirovî ye û azadiya wî mafekî rewa ye. Her wiha pêkhatiyan destnîşan kirin ku Rêber Apo nûner û hêviya tevahiya gelên herêmê ye.**R-3**




## ‘Bi vîn û xwebaweriyê mirov dighêje armancên xwe’



Yekemîn kursa fêrbûna ajotina erebeyan ya taybet bi jinê li bajarê Qamişlo ji aliyê jina bi navê Amed Dilpak ve tê dayîn. Amed diyar kir ku armanca wê ya sereke ji vê pirojeyê ew e ku jin xwedî bawerî û hêz bin.**R-2**

## Evîndarê ziman û wêjeya kurdî; Arşek Baravî



Ehmed Elî yê bi nasnavê Arşek Baravî tê naskirin, yek ji zimanzan û wêjevanê kurd yên berz e. Baravî ji salên 1980’î ve mijûlî ziman û wêjeya kurdî dibe, bêhtirî 20 berhemên wî hene. Ew bi 5 zimanan dizanê lê bûye evîndarê ziman û wêjeya kurdî, xebateke giranbuha di vî warî de kiriye û hîna jî xizmetkariya ziman û wêjeya kurdî dike.**R-7**

## Dîrokeke dagirtî ji serkeftinan; Yaneya Berxwedan



Yaneya Berxwedan di sala 2016’an de hatiye damezirandin. Ev yane bi vîn, hezkirin û berxwedaniyeke mezin xebata werzîşê li ser asta Rojava dide meşandin. Hevserokê Yaneya Berxwedan, Ebdilbaqî Cemal diyar kir ku di demeke kurt de bi derfetên kêm, wan dikarîbû nêzî 200 şampiyon û xelatên cuda werbigirn.**R-6**


Nehîr pale
Mêr sûc dike û ya tê cezakirin jin e **R-2**


Dilyar Cizîrî
Derektina dewleta Tirk, çareseriya aloziya Sûriyeyê ye **R-4**


Farûk Sakik
2 dijmin û 2 xayînên dişibin hev **R-5**


Zekî Bedran
Erdogan kolandina gora Kurdan didomîne **R-5**


Kemal Necim
Pêşbirkên wêjeyî ... bila bibin egera hevrikiya azad **R-7**

# ‘Bi vîn û xwebaweriyê mirov dighêje armancên xwe’

Yekemîn kursa fêrbûna ajotina erebeyan ya taybet bi jinê li bajarê Qamişlo ji aliyê jina bi navê Amed Dilpak ve tê dayîn. Amed diyar kir ku armanca wê ya sereke ji vê pirojeyê ew e ku jin xwedî bawerî û hêz bin.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Piştî destpêkirina şoreşa Rojava jinên herêmê tevlî xebatên cur bi cur bûn, ji qadên leşkerî, siyasî destpê kirin heta ku gihaştin tevahî warên jiyanê, jin di şoreşa Rojava de bûn pêşengên şoreşê û di rêvebirinê de cihê xwe girt. Yek i jinên ciwan yên xwedî piroje û armanc jî, Amed Dilpak e. Ew ji bajarê Qamişlo ye, yekemîn projeya taybet a fêrkirina jinan ji bo ajotina erebeyê pêş xist.

Derbarê pirojeya fêrkirina ajotina erebeyan ya taybet bi jinan, xwediya pirojeyê Amed Dilpak ji rojnameya me re axivî.

Amed Dilpak ku di temeneke biçûk de fêrî ajotina erbeyê bûye da zanîn ku ajotina jinan ji erebeyê re zêdetir birêxistinkirî ye ji ya mêr û wiha got: “Pêwistiya civaka me bi mamosteyên jin ji bo perwerdekirina ajotina erebeyan heye, ji hêla jinan ji ber ku rehetiyeke mezin dibînin dema jineke din wan fêr dike, bi lez agahî dighêjin wan. Di demê berê de şermeke mezin bû jin erebeyê biajo û civak matmayî dima, lê piştî şoreşê ev çend saline ev hişmendî kêm bûye, êdî heta astekê bû diyardeyek. Ez ê



hewil bidim bi alîkariya jinên ku tevlî kursê dibin vê hişmendiyê zêdetir kêm bikin û ji holê rakin.”

**‘Bawerî û hêz bingeha serkeftinê ye’**

Amed Dilpak axaftina xwe wiha dewam kir: “Min xwest ku ez projeyeke wisa xweser pêşbixim. Dem amin ev piroje da pêşiya xwe yên herî zêde pêştgiriya min kirin, hevjîn û malbata min bûn. Hilbet di her karekî de zehmetî hene, lê bi vîna xurt, hêz û baweriyê wê serkeftin her dem li pêşiya mirov be. Zehmetiyên ku ez dikşînim dema jin tên ji bo xwe fêr bikin bi tirs û bêbawerî nêz dibin, lê heta ji min bê ez bi wan re dibim alîkar û hêzê didim. Ya herî giring ew e ku jin xwedî hêz û bawerî bin.”

**‘Fêekirina ajotina erebyê ji bo min karekî pîroz e’**

Amed Dilpak da xuyakirin ku fêrkirina ajotina erebeyê ji bo min karekî pîroz e û wiha berdewam kir: “Dema ez dibînim ku encama xebata min pir sûd jê tê girtin, çend jin li cem min fêr bûn, derçûn û êdî piştre rasterast erbe ajotin, ez bi vê yekê westandina xwe ji bîr dikim û ez kêfxweş dibim, divê hemû jin bi hev re bibin alîkar da ku ajotina erebeyê bibe diyardeyeke normal,



ji mafê her jinekê ye ku hemû karî bike.”

Amed di derbarê kursa fêrkirinê de wiha got: “Di her hefteyê de 3 rojan wane hene û her wane saetek e. Di waneya yekem û duyem de hinekî zehmetî tên kişandin, ji ber kêm bawerî û tirs heye. Di wana sêyem de asta jinan baş dibe. Waneyek heye bi taybetî êvarê wan derdixim çawa di nava tarîtiyê de fêrî ajotinê bibin. Waneyeke din jî heye çawa bi paş ve vegerin. Nêzî 15 jin perwerdeyê dibînin û 4 jin derçûne.”

Amed Dilpak axaftina xwe wiha qedand: “Dixwazim di rojên pêş de projeya xwe berdewam bikim, herwiha ezê hewil bidim berfirehtir bikim da ku beşeke mezin ji jinan fêrî ajotinê bikim û dibistaneke taybet vekim. Divê her jinek xwedî bawerî, hêz û îrade be, da ku karbe armancên xwe pêk bîne.”

**Ji Pênûsa Jin**

**Mêr sûc dike û ya tê ceza kirin jin e**

Nehîr Pale

Li hemû civakan bûyerên gelekî giran di navbera jin û mêr de diqewim in. Ji destpêka derketina sîstema baviksalarî ev pirsgirêk hene û berdewam dikin. Berê jî di encama rê û rêbazên danûstandina jin û mêr de pirsgirêk derdiketin û eger zîhniyeta mêr, rê û rêbazên wî neyên guhertin ev buyer wê bidomin.

Buyer dema ku diqewimin li ser dezgehên raghandinê û dijîtal medîya têne belav kirin. Li hemberî van buyeran çi erênî yan jî neyînî be bertek ji aliyê kesên dîtin û bihîstin ve derdikeve. Gelek caran bê ku buyerê fêm bikin jinê sûcdar dikin an jî malbata wê tê sûcdar kirin. Mêr jî tu carî nayê lêpirsîn kirin. Mêr dema ku jinê dukjê civak jî an wê gunehê xwe bi wê jinê bîne yan jî wê bibêjin gelo vê jinê çi kiriye heyanî hatiye kuştin. Mêr jinê tecawiz dike; ew jin wê were ceza kirin! Ji xwe di vir de tucarî edalet nîne.

Li gundê Kibaşîn ê girêdayî navçeya Şêrawa ya girêdayî bajarê Efrînê çeteyekî gurûpa Feyleq El-Şam a girêdayî dewleta Tirk a dagirker zarokeke 17 salî ji malbata wê direvîne. Wê zarokê işkence û tecawiz dike û piştî rojekê wê vedigerîne gel malbata wê. Bavê keçikê wê dibe nexweşxanê.

Li nexweşxanê fêmdike ku êdî keça wî nema keçike û mîna her bavî dibêje namûsa min gemarî bûye. Bav dixwaze namûsa xwe bi kuştina keça xwe paqij bike. Ji xwe ew zaroka 17 salî dema ku ji aliyê çeteyên Tirk ve hatiye revandin û tecawiz kirin, hate kuştin. Tenê fêzîkî hebûna wê ma ye ew jî bav dixwaze dawî li hebûna wê bîne û şerefa xwe paqij bike. Bavê zaroka 17 salî û hemû xelkên gundê Kibaşîn çima nayê bîra wan an jî fêrnebûne ku li hevdû bicivin û pirsgirêkên xwe nîqaş bikin. Ew xwe birêxistin bikin û xwe biparêzin. Ev ne cara yekeme ku çeteyên dewleta Tirk a dagirker jin tecawiz kirine. Îro zaroka 17 salî bû, wê sibe wisa li yeke dîtir bikin. Mêr sûc dike û ya tê ceza kirin jin e. Çeteyên Tirkiyê ku niha li xaka Efrînê ne rojane xaka Efrîn tecawiz dikin û ziyanê dighînin şêniyên wê. Ne tenê jina Efrînê tê qirkirin, civaka Efrînê bi giştî ji aliyê fîzîkî û çandî ve tê qirkirin.

Li ber çavên civakê rêbazên hovane li hemberî jin têne bikar anîn. Li bajarê El-Enbar ê Iraqê bira xwişka xwe bi zincîreke ve girêdane. Ew zincîra ku pê girêdane dibe ku 10 metro dirêj bû. Mîna ku heywane ji bo nerevê ew asê girêdane. Yên wê jinê xilas dikin dîse mêr in. Ji xwe li ser dezgehên raghandinê dihat gotin ku polîsan jina ji aliyê birayên xwe ve hatiye girêdan xilas kirin. Yên ew girêdane mêrin û yên wê ji girêdanê xilaskirin, dîse mêr in. Di encama vê yekê de dema ku buyerên kuştina jin û tecawizkirina wan diqewimin, tê gotin ku kesan kirine. Ew bûyer baş nayên lêkolîn kirin, îdeolojîk li wan nayê nêrtin. Di encama zîhniyeta baviksalarî de ev bûyer diqewimin û tûndiya li ser jin berdewam dike.

# Jina kurd a rewşenbîr û şoreşger: Exterî Reşol

Îro 67 sal bi ser şehîdbûna jina şoreşger Exterî Reşol re derbaz dibe. Di rojekê weke îro de yek ji jinên çalak û şoreşgerên bajarê Silêmaniyê, Exter Reşol di dema xwepêşandana û pêşwazîkirina cenazeyê Şêx Mehmûd Berzencî de li ber Saraya Silêmaniyê di êrîşa polîsan de şehîd bû.

Di dîroka Gelê Kurd de, bi sedan jinên şoreşger mohra xwe li dîrokê dane. Jinên şoreşger di hişyarkirin û pêşxistina civakê de xwedî roleke bi bandor bûn. Yek ji wan jinan jî Exterî Reşole.

**Exterî Reşol kiye?**

Îro 67’e mîn salvegera şahadeta Exterî Reşole. Ew yek ji çalakvan û şoreşgerên bajarê Silêmaniyê bû ku di dema pêşwazîkirina cenazeyê Şêx Mehmûd Hefîd de di rêzên pêş de cihê xwe girt. Lê wê demê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatin gulebaran kirin û Exterî Reşol di gulebaranê de şehîd bû.

Exterî Reşol di sala 1929’an de li Silêmaniyê ji dayîk bû ye û keça Salih e. Hevjîna stranbêjê Silêmaniyê yê naskirî Reşol Ebdullah bû. Zarokên wan nebû. Yek ji jinên Silêmaniyê ya xwedî paye û çalakvanek Silêmaniyê bû. Exterî û Reşol hevrêyên binemala Şêx Mehmûd Hefîd û Hepsexan Neqîb bû. Di navbera wan de hatin û çûn hebû. Exterî timî li pey azadiyê bû û li qada siyaset û şoreşgerî de xebat dikir. Weke jinek şoreşger ji xebatê qut nebûye û timî tevlî çalakiyên wê demê dibû.



Exterî xwendewar bû û yek ji jinên bihêz a Silêmaniyê bû. Xwedî cihetî taybet a civakî bû. Ji ber vê yekê hevrê û dostê Hepsaxan Heqîb û Zekiye Baban bû. Di çareserkirina pirsgirêkên wê demê yên civakî de roleke berçav hebû.

Di 9’ê Cotmeha 1956’an de Şêx Mehmûd Hefîd ji ber nexweşiyê koça dawî kir. Cenazeyê wî vegerandin bajarê Silêmaniyê. Di 11’ê Cotmeha 1956’an de li ber Saraya Silêmaniyê di dema pêşwazîkirina cenazeyê wî de, kesên cenazeyê Şêx Mehmûd pêşwazî dikirin û raperîna xelkê têkel bû. Ji ber vê yekê di navbera xelk û polîsan de alozî çêbû. Lewma polîs xwepêşanderan gulebaran dike. Di encamê de Exterî Reşol li ber Saraya Silêmaniyê di temenê 27 salî de şehîd bû. Ji ber gulebaranê kesek din jî şehîd bû û nêzî 50 kesan jî birîndar bûn.

Her çiqas di pirtûk û bîranînan de li ser Exterî gelek agahî nînin, lê ji bo bîranîna wê û zindîhiştina navê vê jina şoreşger ji aliyê peykersaz Çêner Nizar ve peykerek jî hate çêkirin. Li ber deriyê Saraya Silêmaniyê û cihê lê şehîd bûyî hatiye danîn. Di roja 24’ê Tîrmeha 2019’an de perde li ser peyker hate rakirin.



# Evîndarê ziman û wêjeya kurdî; Arşek Baravî

Ehmed Elî yê bi nasnavê Arşek Baravî tê naskirin, yek ji zimanzan û wêjevanê kurd yên berz e. Baravî ji salên 1980’î ve mijûlî ziman û wêjeya kurdî dibe, bêhtirî 20 berhemên wî hene. Ew bi 5 zimanan dizanê lê bûye evîndarê ziman û wêjeya kurdî û xebateke giranbuha di vî warî de kiriye û hîna jî xizmetkariya ziman û wêjeya kurdî dike.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Arşek Baravî**

Qada çand û wêjeyê baxeke bedew a civakê ye, bi tayebet çand, wêje û zimanê kurdî, wêjevan û zimanzanên kurd jî, kesayetine ku ji bo parastin û pêşxistina çand, ziman û wêjeyê guh dane wê baxa wêjeya kurdî. Yek ji van kesan Arşek Baravî ye, ew zimanzan û wêjevanê kurd yê ji Rojava ye. Navê wî Ehmed Elî ye, Arşek nasnavê xwe ji şahên kurdan yên dîrokî wergirtiye tê wateya şeka agir û Baravî jî nasnavê eşîreya wî ye.

**Jiyana wî û xwendin**


Di sala 1963’an de li Amûdê ji dayik bûye, lê dê û bavê Arşek ji Bakurê Kurdistanê bi tena xwe koçberî Amûdê dibin. Tu xuşk û birayên wî tune bûn. Ji ber ku bavê Ehmed ango Arşek ji xwendin û zanînê hez dikir, wî bi temenekî biçûk rê kir dibistanê, rojane ew li kerekê siwar dikir û dibir dibistana Emar Bin Yasir a ku diket nav taxên xirstiyanan. Ji ber ku zimanê perwerdeyî



bi zimanê erebî bû, wî gelekî astengî di vî milî de dîtiye. Her wiha heya refa 6’an ji waneyên ku dihatin dayîn fêm nekiriye. Lê wî mijara zimanekî xerîb ji bo xwe nekiriye pirsgirêk û xwendina xwe domandiye. Arşek, serkeftî derbasî qonaxa navîn û amadeyî dibe û di dibistana Ebî Elaa Elmeerî de ya Amûdê xwendiye. Piştî ku bawernameya bekeloriya wêjeyî ya zimanê erebî wergirt, çû Şamê û dest bi xwendina beşa Mafnasiyê kir. Lê di sala yekem ya zanîngehê de ji ber ku li Qasiyûn û Riknedîn waneyên bi zimanê kurdî didan, ji zanîngehê hate dûrxistin. Di sala 1986’an de careke din waneyên zimanê kurdî li Amûdê dane hejmarek mezin ji şagirtên Amûdê. Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re, derfeteke mezin li pêşiya xebata wî ya di derbarê zimanvanî û wêjeyê de çêbû. Ehmed xebata xwe ya girêdayî ziman û wêjeya kurdî didomand û di heman demê de jî di nav saziyên Rêveberiya Xweser de jî karê rêvebirinê û yên cuda dikir. Weke Rêxistina Orkêş a Mafê Mirovan, Yekîtiya Ragihandinê û hwd… Ji wan saziyan jî Zanîngeha Rojava bû, Baravî sala 2018- 2019’an xwebexş, di beşa Wêjeya Kurdî de bûye mamosteyek. Di roja îro de jî di Yekîtiya Rewşenbîran ya Herêma Cizîrê de weke rêbeberê beşa Amûdê cih digre. Ew ji destpêka ku bîrewer bûye, karê şivantiya pez kiriye û heya niha jî di ber nivîs û xebata rewşenbîrî, şivan e.

**Xebata wî ya zimanzanî û wêjevaniyê**

Dema ku Baravî ev qonax dixwend di nav re mijûlî wêje û nivîsîna helbestê dibe, lê ji ber ku nivîsîna bi zimanê kurdî qedexe bû, wî bi zimanê erebî helbest nivîsîne. Di rojekê ji rojan de wan helbestên xwe yên bi zimanê erebî li pêşiya şagirt û mamosteyan dixwîne. Ji ber ku nikarîbû hest û helbestên xwe bi zimanê dayikê derbirîn bike, rondikan dibarîne û ji cergê xwe dinale. Lewma di wê demê de wan helbestan li cem xwe dihêle û paşê wan bi kurdî dinivîsîne. Di wê dema ku ji ber êşa helbesta kurdî rondik dibaranad, vîna wî ya ji bo fêrbûna zimanê kurdî gur bû. Di heman demê de carekê ji ber nivîsên siyasî yên ku li ser dîwarê dibistana ku lê dixwend, bê sûnc ji aliyê rêjîma Baais ve tê girtin û bi tundî tê işkencekirin. Sedem ew bû ku Arşek şagirtekî kurd bû, hate cezakirin. Lê ev yek ji zimanzan Arşek Baravî re bû hanedan û hêzek ku bibe têkoşerê pênûs û zanînê, her wiha dest bi xebata zimanzanî û wêjeyê bike. Ew di sala 1981’î de ji bo ku xwe fêrî zimanê kurdî bike, diçe Libnanê û pirtûka Cegerxwîn dikire. Ew bi riya hevrûkirina di navbera tîpên inglîzî û kurdî de fêrî zimanê dayikê dibe. Her wiha di sala 1981’ê de mijûlî aliyê çandî dibe û yekem koma Folklorî ya bi navê Mîdiya li navçeya Amûdê avadike. Di sala 1982’an de jî di nav qada şoreşgerî ya Tevgera Rizgariya Kurdistanê de dibe wergervanê erebî, kurdî û tirkî. Hêjayî gotinê ye ji bilî kurdî, ew bi zimanê tirkî, erebî, farisî û inglîzî jî dizane biaxive û binvîse. Lewma wî ferhengek bi navê Ferhenga Çeleng bi 2 çapan amade kiriye. Ehmed (Arşek) di salên 1980’î de pirtûka rêzman a Celadet Bedirxan û hin pirtûkên din xwendin û di heman demê de jî rexne kirine û nirxandine. Weke ku Arşek dibêje: “Piraniya pirtûkên ziman û rêziman yên ku nivîskarên kurd amade kirin, ne li gorî hizir û zimanê civaka kurdî ne. Nimûne em bêjin, Celadet di bin bandora zimanê tirkî de xebata rêzman û zimanê kurdî kiriye. Lewma min biryar da ku ez bi felsefa kurdî bihizirim û di vî warî de xebatên zimanzaniyê bidomînim. Arşek Baravî bêhtirî xwe guh daye ziman û rêzmana kurdî û yekem pirtûka girêdayî ziman di sala 1988’an de bi navê Rista Hokirina bi awayekî veşartî çap kir. Di sala 2005’an de ew



dixwaze pirtûka Zar û Ziman bişîne Şamê û çap bike, lê ji aliyê rejîma Baas a wê demê ve tê girtin, lewma Arşek neçar dimîne ku li Beyrûta Libnanê di heman salê de çap bike. Wî xebata xwe ya zimanvaniyê domandiye û berhemên têkildarî zimanê kurdî de nivîsiye.

**Berhemên wî**

Ehmed Elî yê ku bi navê Arşek Baravî tê nasîn, xebateke bi nirx ji bo wêje û zimanê kurdî kiriye. Hêjayî gotinê ye ku heya niha 10 berhem çap kirine û bêtirî 10 berhemên din hîna çap nebûne. Yên ku çap bûne ev in; Rista fêrkirina Zimanê Kurdî (1), di sala 1988’an de çap bûye, pirtûka Hokarê Kurd (1) di sala 1989’an de hatiye çapkirin. Her wiha pirtûka Zar û Ziman di sala 2005’an de û Ferhenga Çeleng çapa 0 û 1’ê di sala 2017’an de çap bûne. Romana Jiyan di sala 2020’an de û pirtûka Zarê Zêrîn çapa 1’ê di heman salê de hatine çapkirin. Hem jî pirtûka Zarê Zêrîn çapa 2’yan û ABC ya Kurdî û ola Zerdeştî û Dîroka ABC ya Kurdî di sala 2022’an de hatiye çapkirin. Berhema Arşek ya dawîn ku hatiye çapkirin jî pirtûka Wêjeya Kurdî ye, di sala 2023’an de weke lêkolîn çap bûye. Baravî xebata xwe didomîne û pênûs li gel ked û xwêdanê ranaweste. Pirtûka wî ya ku niha li ber çapê ye; Dîroka Gelê Kurd e. Li aliyekî din jî li gel wî cureyeke wêjeyê taybet ya kurdî afrandiye, cureya kevanên helbestî ango tabloyên helbestî. Wî 6 kevanên helbestî nivîsîne û her kevanek di hundurê xwe de nêzî 60 helbestî dihewîne. Berhema ku niha li ser kar dike jî cureyeke nûjen e, ew jî romana helbestî ye.

**Têbînî**



**Pêşbirkên wêjeyî … bila bibin egera hevrikiya azad**

Kemal Necim

Di çend salên dawiyê de li Rojavayê Kurdistanê pêşbirkên wêjeyê yên gelek cureyên wêjeyê têne lidarxistin, mîna pêşbirkên helbestê, çîrokê, romanê û deqên şanoyê. Lê ka heta çi radeyê ev pêşbirk bûne egera pêşketin û geşebûna qada wêjeyê?

Bê guman pêşbirkên wêjeyê çalakiyên pir girîng in.

Pêşbirkên wêjeyî ji bo afirînerî û jêhatîbûna di nivîsandina wêjeyî de têvedaneke xurt pêk tîne û dibe sedema pêşketina civata wêjeyî bi giştî. Pêşbirkên wêjeyî balê dikşîne ser berhema wêjeyî û derfetê dide ku ew berhem bêhtir were xwendin, ev jî dihêle ku ezmûna nivîskar di warê pêşdebirina nivîsa xwe de bihêztir bibe û li ser karê xwe bixebite da ku xelatan werbigire. Yek ji armanca pêşbirkan jî danasîna berhemê ye û bilindkirina nirxa wê ya wêjeyî ye.

Yek ji rolên girîng yên pêşbirkên wêjeyî ku çanda pêşbazî û hevrikiyê xwert dike di navbera nivîkaran de da ku çawaniya berhemê wêjeyî bilindtir bibe û her yek ji wan nivîskaran berhemên baştir pêşkêş bikin. Ji bo gelek nivîskaran serketina di pêşbirkeke wêjeyî de tê wê wateyê ku ew gihîştine asteke diyarkirî ya afirîneriyê, ev jî wan têvedide ku xwe bigihînin asteke bilindtir.

Çand yan jî kevneşopiya lidarxistina pêşbirkên wêjeyî ne tiştekî nû ye, lewma di nava civaka wêjeyî de bûye weke kevneşopiyeke naskirî û rê û rêbaz û teşeyên lidarxistna van çalakiyan hatine nasîn. Ango dema em bêjin ku civka wêjeyî ya Kurdî tê dest bi lidarxistina pêşbirkên wiha bike, dê ne afrêneriyeke nû pêk bîne û ji nû de rê û rêbazên wê peyda bike.

Cihê şanaziyê ye ku di deh salên dawiyê de li Rojvayê Kurdistanê çanda lidarxistina van pêşbirkan pêş ketiye. Lê belê cihê mixabiniyê ye jî ku di pêvjoya lidarxistina van pêşbirkan de pir kêm û kurtî jî derdikevin carna van pêşbirkan bê wate dikin. Ji van kurt û kêmasiyan:

-Saziyên ku van pêşbirkan lidardixin ne agahdarê rê û rêbazên lidarxistina van çalakiyan e, lewma em dibînin ku pêşbirkan têxin nava bernameyên mihrîcanên wêjeyî. Ango mihrîcanekê lidar dixin, di nava bernameya mihrîcanê de jî pêşbirkekê pêk tînin.

-Ji bo xwendin û niraxndina berhemên ji bo pêşbirkê hatine rêkirin, pêwîstî bi komîteyeke tekûz û pispor û hosta heye, lê pirê caran saziyên ku pêşbirkan lidardixin guh nadin vê mijarê. Ev jî rê li pêşiya bêbaweriyê vedike.

-Nirxên xelatên pêşbirkan pir kêm e, lewma nabe têvedan ji bo beşdariya pêşbirkan.

-Pir caran, heman nivîskar beşdarî hemû cureyên pêşbirkan didin. Ango yê ku beşdarî pêşbirka helbestan dibe, diçe beşdarî pêşbirkên çîok, roman û deqên şanoyê jî dibe.

-Çanda dilnizmî, hevpejirandinê kêm e, lewma her nivîskarê ku di pêşbirkê de bi ser neketibe, encaman napejirîne û komîteyên nirxandinê yan saziya xwediya pêşbirkê tewanbar dike. Li şûna ku pêşbirk bibe egera hevrikî û pêşbaziya bi rûmet û xwebeş, dibe egera kîndarî û dilreşiyê.

Pirt girîng e ku ev çanda lidarxistina pêşbirkên wêjeyî ji hêla saziyên agahdar û pêkhatî ve bêne lidarxistin û aliyên têkildar jî piştevaniya van pêşbirkan bikin ta ku bibe çand û kevneşopiyeke wêjeyî ya hêja.

# Dîrokeke dagirtî ji serkeftinan; Yaneya Berxwedan

Yaneya Berxwedan di sala 2016'an de hatiye damezirandin. Ev yane bi vîn, hezkirin û berxwedaniyeke mezin xebata werzîşê li ser asta Rojava dide meşandin. Hevserokê Yaneya Berxwedan, Ebdilbaqî Cemal diyar kir ku di demeke kurt de bi derfetên kêm, wan dikarîbû nêzî 200 şampiyon û xelatên cuda werbigirn.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**



Yaneya Berxwedan, li rex Yaneya Asayîşê, Serdem û hwd… li gor pênaseya Yekîtiya Werzîşê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê; ew yek ji saziyên ku mijûldarî çalakî û lîstkên werîşê dibe ye. Ev yane ji sala 2016'an ve xebat dike, lîstikvanan rahênan dike, rahênankarên ji bo perwerdekrina lîstikvanan dike û gelek bi çalakiyên din dike. Herwiha di derbarê damezrandina Yaneya Berxwedan, beşên wê û astengiyên ku derdikevin pêşiya xebata wê ya werzîşê, heverokê yaneyê, Ebdibaqî Cemal ji rojnameya me re axivî.

**Dîrok û navlêkirina Yaneya Berxwedan**

Ebdilbaqî Cemal têkildarî dîroka Yaneya Berxwedan û navlêkirina wê wiha got: "Yaneya Berxwedan di sala 2016'an de hate damezrandin, di wê demê de, mercê Yekîtiya Werîzşê ya damezrandina yaneyan di wê demê de, her yaneyek du lîstk an jî beşê sporê yên komî û du lîstkên tekane bihewîne nava xwe. Lîstkên komî mîna goka piyan, volîbol, goka destan û hwd… û lîstkên tekane jî mîna lîstka kişik (şetrenj), bîmbon û hwd… Me gelek astengî di wê demê de dîtin û heta Yaneya Berxwedan hate damezrandin û kadirên bisporên werzîşê çêbûn ji bo me tiştekî zor û zehmet bû. Lê tevî wiha jî me karîbû ku yaneya xwe ava bikin. Navlêkirina Berxwedan, ji berxwedaniya gelê kurd yê Bakurê Kurdistanê a li dijî faşista Tirk hatiye wergirtin. Bi taybet berxwedana di hundurê zindanan de a ku weke şehîd Mezlûm Doxan da meşandin û hîmê berxwedanê ava kir. Armanc ji damezrandina yaneyê ew bû ku ciwanan bi werzîşê ve girêdin, jiyana wan rêxistin bikin. Herwiha derfetê li pêşiya hezkerê werzîşê vekin û werzîşa herêma xwe li pêş bixin, li aliyekî din ne tenê armanca me spor û werzîş e, lê belê civakek saxlem û ciwanên xwedî jiyaneke dirust e.

**Beşên wê**

Cemal têkldarî beş û lîstikên di Yaneya Berxwedan de cih digrin wiha anî ser ziman: "Beşên ku cihê xwe di nav digirin 4 in, beşê goka piyan, tîmê zarokan yek jê yê nûhatiyan e û yê din yê zarokên yên ku temenê nûhatî derbas kirine. Herwiha tîmekî gêncan jî û yekî din yê mezinan heye. Li aliyekî din beşê goka destan ango bolîbol heye, di nav de jî tîmekî taybet yê jinan heye û tîmekî mêran jî digire nava xwe. Di heman demê de beşê bîmbonê ango goka masê heye ew jî ji bo jinan, zarok, zarokên nûhatî, gênc û mezinan heye û ji bo şetrenj ango kişik jî wiha ye. Beşek Yaneya Berxwedan li Kobanê heye, li Efrînê jî hebû lê di encama êrişa dagirkeriya Tirk de têk çû, lîstikvan û rahênankarê wê jî der bi der bûn. Di roja îro de hejmara lîstikvanên Yaneya Berxwedan ji 150 lîstikvanan heya 200'î ye û hejmara kotş ango rahînanvanê wê nêzî 10'an e. Ev rahênankarên wê bispor in, bawernameyên ji Yekîtiya Werzîşê ya kantona Cizîrê û Şampiyona Sûriyê bi wan re ne. Lîstikvan û rahênankar li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne û niha ji hemû pêkhateyên herêmê bi kurd, ereb, siryan û hwd… cihê xwe di nav yaneya me de digirin. Eger mirovek bixwazîbe tevlî yaneya me bibe, dikare serdana me bike û tu şert û mercên tevlîbûnê tune ne. Tişta pêwîst ew e ku lîstikvan xwedî sinc û rewştên baş be, ji Yaneya Berxwedan hez bike û jê re sozdar be. "

**Serkeftinên wê**

Ebdilbaqî di derbarê serkeftinên ku Yaneya Berxwedan pêk anîne û qezenc kirine wiha eşkere kir: "Destpêka ku Yaneya Berxwedan hate damezrandin, rastî astengiyan hat, lê dikarî van astengiyan derbas bike. Me di wê demê de dikarî ji derfetên kêm beşên xwe yên siporê ava bikin û lîstikvanan amade bikin. Lewma di sala 2016'an de dema ku şampiyona bîmbonê li ser asta Rojava çêbû, tîma me ya bîmbonê ya zarokên nûhatî û tîma zarokan şampiyon di asta yekem de wergirtin. Di heman salê de jî şampiyona kişkê li ser asta kantona Cizîrê çêbû, 12 lîstikvan di tê de beşdar bûn, 9 ji wan yên Yaneya Berxwedan bû û yên din ji yaneyên cuda bûn, me ew şampiyon jî qezenc kir. Bi domana demê re êdî şapiyonên lîstikên din yên goka piyan, goka destan, taykwando û hwd… yên tîmên zarok, zarokên nûhatî, jinan û mezinan bi dest xistine. Ji destpêka damezrandina Yaneya Berxwedan heya îsal, nêzî 200 şampiyon û ast û xelat wergirtine, ji wan şampiyon û xelatên takekesî û komî ne. Bi rastî Yaneya Berxwedan tevî ku derfetên wê kêm bûn, lê dîsa jî dikarî ewqas serkeftinan di demeke kurt de pêk bîne. Herwih li ser asta Rojava muhra zêrîn li werzîşê bide. "



**Astengiyên derdikevin pêşiya Yaneya Berxwedan**

Hevserokê Yaneya Berxwedana girêdayî astengiyên derdikevin pêşiya yaneyê wiha axivî: "Weke tê zanîn sipor û werzîş tiştekî girîng e, heya ku pêşketin di warê werzîşê de pêk were, pêwîste rahênan û perwerde raneweste. Ji bo Yaneya Berxwedan jî domandina rahênana lîstikvanan tiştekî girîng e. Em di vî warî de astengiyan dikşînin ji ber ku cihê ku lîstikvan lê werin rahênankirin ya taybet bi yaneya me tune ye, lewma divê stadên ji bo perwerdekirina hemû beşên siporê werin çêkirin. Rastî derfet û karîna abûrî ya yaneyê lawaz e ji bo çêkirin cihên perwerdeya lîstikvanan. Lîstikvanên me diçin stada 12'ê Adarê û ya Heysem Kiço, di demeke destnîşankirî heftane û rojane û li wir perwerde distînin, ev yek jî bi pereyan e. Tevî ku hêz û derfeta aborî pir kêm e jî, lê rahênankirin û perwerdeya werzîşê ranaweste, lê dîsa em gelekî zorleme dibin. Astengiya din jî ji ber hêza aborî ya kêm e ku yaneyên din yên ku xwedî hêzên aborî ne, lîstikvanên me yên bijartî û zane bi riya pereyên zêde dikşînin nav yaneyên xwe, heya niha gelek rewşên wiha çêbûne. Lewma jî heya ku em van astengiyan derbas bikin, pêwîste ev pirsgirêka hêza aborî ya Yaneya Berxwedan were çareserkirin, ev yek jî dikeve ser milê Yekîtiya Werzîşê. Niha em weke Yaneya Berxwedan, daxwaza terxîskirina yaneya xwe ji Yekîtiya Werzîşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê re pêşkêş kiriye û li benda erêkirina wê ne ji bo ku bi rêkûpêkî werzîşê li pêş bixin û gavên bi nirx bavêjin pêş. "

# Perwerdekirina mamosteyan li ser minhacên nû

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

**Endamê Komîteya Perwerdê ya Desteya Fêrkirin û Perwerdeyê ya Kantona Cizîrê Rênas Fetah diyar kir ku di demsala havînê de, wê dewreyên perwerdeyê ji bo mamosteyên refên ku minhacên wan hatine guhertin, bên vekirin.**

Desteya Fêrkirin û Perwerdeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dest bi guhertina minhacên xwendinê yên asta seretayî, amadeyî û navîn kiriye, ji bo ku tu şaştî û kêmanî nekeve pergala xwendinê, wê saziya minhacan ya girêdayî desteyê li ser sê qûnaxan minhacan bighurîne, li gel guhertina minhacan diviyabû ku mamosteyên dibistanan li gorî minhacên nû xebat bimeşînin, ji ber vê yekê, wê ji bo mamosteyan di demsala havînê de dewreyên perwerdeyê dest pê bikin. Ev perwerdeya bê dayîn jî wê têkildarî şêwazên xwendinê û naveroka minhacan be da ku bi awayekî rast û baş xwendekaran fêr bibin. Têkildarî vê mijarê endamê Komîteya Perwerdê ya Girêdayî Desteya Fêrkirin û Perwerdeyê ya kantona Cizîrê Rênas Fetah ji rojameya me re axivî.

Rênas Fetah anê ziman ku perwerde tenê ji bo mamosteyên ku minhacên wan ên sala nû hatiye guhertinê wê bê dayîn û wiha pê de çû: "Di sala nû ya xwendinê de wê minhacên xwendinê yên refên 1, 4, 7 û 10'an bên guhertin, wê mamoste li gorî vê yekê perwerdeyê bibînin, herwiha wê li bajar hinek mamosteyên yedek hebin ji bo di rewşên awarte de wan derbasî dibistanan bikin. Wê mamosteyên seretayî û branşan bi giştî perwerde bibînin, wê perwerde li ser du qûnaxan be, ya yekemîn wê navendî be, her bajarek wê komîsyonên wê bên erkdar kirin ji bo dayîna perwerdeyê, ya din jî li bajaran li gorî pêwistiyan wê mamosteyan teyîn bikin û perwerdeyê bidin."

Rênas Fetha derbarê dema qedandin û dirêjiya perwerdê de wihagot: "Dema qedandina perwerdê û dirêjiya wê li ser minhac dimîne, dibe ku perwerdeya refa yekê hefteyekê dirêj bike û yên din mehekê dirêj bike, dema her minhacekî li minhac bi xwe dimîne."

Rênas Fetah derbarê giringiya dayîna vê perwerdeyê de wiha anî ziman: "Pêwîste ji bo minhacê nû, şêwazên hatine amadekirin û şêwazên waneyên nû perwerde bên dayîn, divê ji mamosteyan re bê zelalkirin da ku dema perwerdeyê bidin bi awayekî rast agahiyan bighînin xwendekaran. Herwiha mamoste ji bo sala bê amade be û karê xwe bi temamî li gorî minhacên nû bike. Em ê hewil bidin şaştî û pirsgirêkên xwendinê di riya perwerdê de ji holê rakin. Minhac wê nû be li ser mamosteyan, guhertinên cewherî wê çênebûbe, lê şêwaz û wane bi giştî hatiye guhertin ji bo şaştî nebin me ev perwerde giring dît ku em çêbikin."



Rênas Fetah pirsgirêkên li hember wan derkevin anî ziman:" Ji ber ku perwerde di demsala havînê de ye wê mamosteyên ku perwerdê bigrin zehmetiyek mezin bikşîne, ji ber ku germahî heye ev yek dihêle ku nerehetiyekê li cem mamoste çêbike, ev yek dihêle ku perwerde bi aywayekî hêsan û baş neghêje mamoste. Herwiha di mijara diyarkirina komisyonên ku perwerdeyê bidin hinekî dem dibe û dibe ku rewşên din jî derkevin."



# Pêkhateyên Cizîrê; Azadiya Rêber Apo mafekî rewa ye

Endamê Insiyatîfa azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê, Fûad Çolî destnîşan kir ku armanc ji serdana Insiyatîfê ji pêkhateyan re azadiya Rêber Apo ye. Herwiha Çolî anî ziman ku daxwaza sereke ya pêkhateyên herêmê azadiya Rêbertî dikin.

**Navenda Nûçeyan**

Di 10'ê Gulanê de Insiyatîfa azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê dest bi serdana tevahiya partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Sûriyê kir û di 28'ê heman mehê jî serdan bi dawî bûn.

Piştî van serdanan jî, Insiyatîfê di 29'ê Pûşberê de dest bi serdana eşîr, oldar û pêkhateyên cihêreng yên kantona Cizîrê kir û hîna jî ev serdan tên domandin.

Di serdanên ku tên kirin de felsefe, nêrîn û ramanên Rêber Apo tên nîqaşkirin û şîrovekirin. Di heman demê de jî mijara binpêkirinên ku di derheqê Rêber Apo de li Îmraliyê tê kirin û şert, merc û cezayên ku li ser wî têne ferzkirin, tê nîqaşkirin.

Têkildarî serlêdanên Insiyatîfa azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê ya ji bo eşîr, oldar û pêkhateyên cihêreng yên kantona Cizîrê, endamê Insiyatêfê Fûad Çolî ji rojnameya me re axivî.

**'Armanca sereke ji serdanan, azadiya Rêber Apo ye'**



Çolî diyar kir ku armanc ji serdanên insiyatîfê pêkanîna azadiya Rêber Abdullah Ocalan e û wiha got: "Wekî em dizanin ku ji Cotmeha sala borî ve pêngava cîhanî ya ji bo azadiya fîzîkî hate destpêkirin, niha jî di qonaxa 2'yan de tê domandin. Me jî xwest ku xebatekê din ji bo azadiya Rêber Apo bidin meşandin, lewma me dest bi serdana zêdeyî 32 partiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Serdanên di wê demê de me serdana partiyên kurdî, erebî, siryanî û hwd… kir. Piştî wê jî me dest bi pêngava duyem a serdanan kir, di asta yekê de em çûn li gel pêkhateya erebî û me serdana sê şêxên eşîreyên ereban kir weke eşîreya Şemer, Tey û Cibûr. Herwiha me serdana dêreke siriyaniyan kir û hem jî em çûn Mala Êzîdiyan. Di pilana pêngava me de ye ku em serdana eşîreyên kurd û aşûriyan jî bikin. Ev pêngava ku em niha didin meşandin, li ser asta kantona Cizîrê ye, lê di rojên pêş de em ê hewl bidin ku serdana eşîre û oldarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikin. Armanc ji serdanan ew e ku pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya di derbarê tecrîda li ser Rêber Apo tê meşandin de xwedî çi helwestin? û hem jî pêkhate bêtir tevlî pêngava cîhanî ya ji bo azadiya Rêber Apo bibin. "

**'Xwesteka pêkhateyan, azadiya Rêber Apo ye'**

Fûad Çolî dest nîşan kir ku daxwaza pêkhate û partiyan azadiya Rêber Apo ya fîzîkî ye û wiha domand: " Ji xwe destpêkê me serdana partiyên siyasî kir, di wan serdanan de, sekretêr, serok, hevserok û endamên partiyên siyasî di derbarê pêkanîna serdanan de xwedî helwesteke erênî bûn. Partiyên siyasî dan xuyakirin ku tecrîd siyasteke derqanûnî û bêexlaqî ye. Ji ber wê jî, partiyan diyar kirin ku ew ê bi cidî tevlî pêngava azadiya Rêber Apo bibin û xebateke diblomasî di vê derbarê de bidin meşandin. Herwiha pêkhate jî di derbarê tecrîda ku li ser Rêbertî tê meşandin de xwedî nerîneke girîng in.Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, tînin ser ziman ku tecrîda li ser Rêber Ocalan dermirovî ye û azadiya wî ya fîzîkî, mafekî rewa ye. "



**'Ji bo bidawîkirina tecrîdê name hatin şandin'**

Endamê Insiyatîfa azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyê, Fûad Çolî anî ser ziman ku ji bo azadiya Rêber Apo heta niha 13 name ji aliyên eleqedar li ser asta Rojhilata Navîn hatine şandin û wiha axivî: "Pêkhateyên herêmê û cîhan bi giştî ketine wê baweriyê ku ramanên Rêber Apo riya çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn bi giştî ne. Bi rastî niha gel li ser asta cîhanê vê pêngavê didin meşandin. Xebat û peywendî bi dewletên ereban û kesayetên curbecur û rêxistin ereban re tên kirin. Hem jî me weke Insiyatîfa Sûrî ya ji bo azadiya Rêber Abdulah Ocalan 13 name ji sazî, rêxistin û aliyên xwedî nêrînên bi bandor li ser asta Rojhilat Rojhilata Navîn re rê kirin weke Komkara Erebî û hine din. Li aliyekî din jî wê çalakiyên ji bo azadiya Rêber Apo li vir û li cîhanê bi giştî werin domandin. "

# Ji serok û ruspiyên eşîrên kurd dijî dagirkeriyê û xiyanetê banga girîng

**Serok û rûspiyên eşîrên Kurd ên li Herêma Cizîr, li hemberî êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê û xiyanetê bang kirin. Rûspiyan diyar kirin şerkirina li hemberî gerîla xiyaneta herî mezin û bang li endamên koma bi navê 'pêşmergeyên roj' kirin ku vegerin. Ji Partî û hêzên siyasî jî hat xwestin ku berpirsyariya xwe bi cîh bînin.**

Serok û rûspiyên eşîrên Kurd ên li Herêma Cizîr a Rojavayê Kurdistanê, derbarê êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk û xiyaneta li hemberî gerîlayên azadiya Kurdistanê tê kirin de, daxuyaniyek da çapemeniyê.

Di daxuyaniya ku li Parka Serdem a li bajarê Hesekê hat dayin de, serok û ruspiyên eşîrên Kurd ên Badîna, Gabara, Mihelmî, Kîka, Saroxana, Rimika, Omera, Dena Êzidiya, Deqorî, Şêxî, Sorkî, Mêrsinî, Ebasa, Mendan, Basiqlî, Hevîrka, Tezat, Koçerî, Mîran, Xelcan, Selxî, Batwa, Dazoran Dodkî, Melan, Teyan, Botî, Morîka, Al Rusem Axa, rûspiyên terîqeya Qadiriyê amade bûn. Daxuyanî li ser navê serok û rûspiyên eşîran ji aliyê mamosteyê zimanê Kurdî Ezîz Elî yê ji eşîra Sorkî ve hat xwedin.



**Daxuyaniya ku bangên girîng hatin kirin wiha ye:**

"Em serok û rûspîyên eşîrên Kurd ên Herêma Cizîrê ya Rojavayê Kurdistanê, bi xemeke mezin êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê dişopînin. Li Başûrê Kurdistanê li dijî gelê me lîstokek mezin di meriyetê de ye. Dewleta Tirk di nav hewldanan de ye ku Kurdan bi Kurdan bide şerkirin. Mixabin PDK'ê xizmeta van êrîşên dagirkeriyê dikin û dibin şirîkên lîstoka qirkirina Kurdan bi destê Kurdan. Her şerek navxweyî yê di navbera birayên Kurd de, tenê di xizmeta dijminên me de ye û dibe sedema perçebûna yekrêziya me, lawazkirina bergiriya me li hember pirsgirêkên mezin ên li pêşiya me.

**Xiyaneta herî mezin**

Li gorî zanyariyên heyî, hêzên Başûr ciwanên Kurd ên Rojavayî yên di nav koma pêşmergeyên roj de dibe herêmên Zap, Metîna û Avaşîn, wan li hemberî gerîla dixe nav şer. Ev rewş mijarek cîdî ye û ji bo me cîhê şermê ye. Gêrîla şeref û rûmeta me ye. Xwedîderketina li gerîla erka herî pêş a hemû Kurdan e. Şerkirina li hember gerîla, xiyaneta herî mezin e li dijî gelê me.

**Vegerin**

Em li vir bang li ciwanên xwe yên ku li Başûrê Kurdistanê di nav pêşmergeyên roj de ne dikin û dibêjin: 'Ji bîr nekin hûn ji ku derê hatine û nekevin xizmeta lîstokên dijmin. Dijmin dixwaze Kurdan bi destê Kurdan qetil bike. Dixwaze şerê birakujî derxîne. Her kî bikeve xizmeta vê planê, ew di nav xiyanetek dîrokî de ye. Divê kes nebe perçeyek ji van lîstokan. Em zarokên gelê bi rûmet in. Em her li ku derê bin, divê em xwedî rûmet bin berjewendiyên gelê xwe biparêzin. Em bang li ciwanên xwe dikin ku vegerin ser axa xwe, li hember êrîşên li ser axa xwe parastina Rojava bikin.'

**Bi erka xwe ya dîrokî rabin**

Em bang li serokên partî û hêzên siyasî yên Kurdistanî dikin ku bi erkên xwe yên dîrokî û neteweyî rabin, ji her tiştê ku dibe sedema nakokî û pevçûnan dûr bikevin. Em bi bîr tînin ku yekîtî û biratî, çeka herî bi hêz e ku em pê gelê Kurd li hember metirsî û êrîşkariya dijmin biparêzin.

Di dawiyê de, em ji xwedayê mezin daxwaz dikin ku Kurdistana me ji hemû ziyanan biparêze û me ji rêya silametî û aramiya gelê me û neteweya me dernexe."

# Polîtîkaya avê ya Tirkiyeyê: Şer û talan

Tirkiye bi bendavên ku daniye ser çemên Dîcle û Firatê li Sûriye û Iraqê dibe sedema pirsgirêka avê, li nava welêt jî bendavan weke rêbazeke şerê taybet li dijî PKK'ê bi kar tîne.



**Navenda Nûçeyan**

Di vê dosyayê de em ê bi taybetî bala xwe bidin ser wê yekê ku Tirkiye çemên Dîcle û Firatê bi çi rengî li hemberî Tevgera Azadiyê ya Kurd û Iraq û Sûriyeyê bi kar tîne. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, bi hewldana hevpar a hin dewletên li Mezopotamyayê, ji bo avakirina avaniyên avê yên mezin ên li ser çemên Firat û Dîcleyê hin projeyên biçûk destpê kirin. Piştî ku li Iraq û Sûriyeyê serxwebûn hate ragihandin, van welatan di vê çarçoveyê de têkilî bi Tirkiyeyê re danîn û di sala 1947'an de Iraqê bi Tirkiyeyê re protokolek îmze kir. Li gorî protokolê dema ku li ser avê û mijarên cuda nakokiyan rû dan, hingî wê serî li Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî bê dayin. Heta salên 1970'yî piraniya avaniyên li ser çemên Dîcle û Firatê hatin avakirin ên dewletên Iraq û Sûriyeyê ne. Di salên 1980'î de bi destpêkirina projeyên mezin ên Tirkiyeyê re pirsgirêka avê di navbera hersê dewletan de destpê kir. Bendavên mezin ên ku Tirkiyeyê di çarçoveya Projeya Anatoliyê ya Başûrrojhilat (GAP) da destpêkirin, di sala 2020'î de bi temamkirina Bendava Ilisûyê re ku Heskîf di nava avê de hişt, tevî ku tenê nîvê projeya avdanê ya li tejeneya Firatê ya ji bo Sûriye û Iraqê qediya ye, ji sedî 40 ê ava tê berdan hate qutkirin.

### Tirkiyeyê bi ya xwe kir

Di nava salan de ne Iraqê ne jî Sûriyeyê di vê mijarê de li hemberî Tirkiyeyê nekarîn polîtîkayeke bi bandor bimeşînin. Dawiya dawî şer û rewşa ku Tirkiye yekser li Sûriyeyê bû aktorekî şer, polîtîkayên avê yên li vê derê jî guhert.

Ji Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê Ercan Ayboya têkildarî vê polîtîkaya avê gotarek nivîsî û bi taybetî destnîşan kir ku bendavên li aliyê Tirkiyeyê weke çekeke polîtîk li dijî Rojava hatine bikaranîn. Di sala 2020'î de li Bendava Tişrînê ziwabûnekê rû da. Hevseroka Meclîsa Sûriyeya Demokratîk a wê demê Îlham Ehmed di 1'ê Tîrmeha 2020'î de li ser Twîtterê dîmenek parve kir û bal kişand ser wê yekê bê bendavên li ser Çemê Firatê bi çi rengî dibe sedema ziwatiyê li Sûriyeyê. Rêveberiya Bendava Tişrînê jî diyar kir ku ji ber kêmbûna ava Çemê Firatê ya ji ber Tirkiyeyê, ew neçar mane ku dema dayina eletrîkê ya ji bo Rojava kêm bikin.

### Parçeyek ji şerê taybet

Tirkiyeyê bendavên li ser çemên Dîcle û Firatê ava kirî, li derveyî sînor weke çekeke dîplomatîk bi kar anî. Li aliyê din jî çemên din ên li nava welêt jî weke amûrek ji şerê taybet ê li dijî PKK'ê bi kar dianî. Tirkiyeyê şewat, çêkirina rê û hwd. weke parçeyek ji şerê talankirina xwezayê bi kar anî. Yek ji rêbazên sereke yên Tirkiyeyê jî bendav bûn. Di rapora karên 2007'an a Midûriyeta Karên Avê yên Dewletê ya Wezareta Daristan û Hawirdorê de ev karê ku dihate kirin bi gotina 'ewlekariya sînor' bi şênberî wiha dihate vegotin:"Di sala 2007'an de di çarçoveya etut-projeyê ya bernameya razemeniyê de bi sedema ewlekariya sînor 11 Bendên Komkirina Avê, projeyên bendavê pêşkêşî îhaleyê hatin kirin û temamkirin.

Ew proje jî bi vî rengî ne: 1. Çêkirina Projeya Bendava Şirnex-Silopiyayê, 2. Çêkirina projeya Bendava Şirnexê, 3. Çêkirina Projeya Bendava Şirnex-Qilabanê, 4. Çêkirina Projeya Bendava Şirnex-Balli, 5. Çêkirina Projeya Bendava Şirnex-Kavşaktepe, 6. Çêkirina Rojeya Bendava Şirnex-Mûsatepe, 7. Çêkirina Projeya Bendava Şirnex-Çetîntepe, 8. Çêkirina Projeya Bendava Şirnex-Çocûktepe, 9. Çêkirina Projeya Bendava Colemêrg-Golgelîyamaç, 10. Çêkirina Projeya Bendava Colemêrg-Beyyûrdû, 11. Çêkirina Projeya Bendava Colemêrg-Aslandagi."

Ev projeyên ewlekariyê li ser sînorê Tirkiye-Iraqê yê bi dirêjahiya 380 kîlometreyî ji bo astengkirina liv û tevgera gerîlayên PKK'ê bi giranî li sê herêman hatin plankirin. Di sala 2008'an de piştî ku ev bendav ketin rojeva raya giştî, TMMOB'ê di sala 2009'an de raporek rexnekirina van bendavan amade kir û zexta civakî zêde bû. Di encama vê zextê de jî 7 ji van bendavan di sala 2012'an de ji statuya 'bendava ewlekariyê' hate derxistin û weke Santrala Hîdro-Elektrîk (HES) hate pênasekirin. Bendav bûn hîmekî polîtîkaya îskanê. Tenê di avakirina Bendava Ilisûyê de 1000 gund hatin valakirin. Gel neçarî koçberiyê hate hiştin.

## Derektina dewleta Tirk, çareseriya aloziya Sûriyayê ye



**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka aloziya Sûriyayê di nava hewldanan de ye, sînorê "Mîsaqa Milî" bi cih bîne û beşeke mezin ji xaka Sûriyê dagir bike. Ji bo siyasetên xwe li ser xaka Sûriyê pêk bîne, bi dehan komên çete ava kir.

Wan ji bo berjewendiyên xwe li hemû qadan dijî gelê Sûriyê bikar anî. Ji êrîşa sala 2012'an a li dijî Serêkaniya Rojavayê Kurdistanê bigir û heta êrîşên dagirkeriyê yên li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî. Hemû bi planên qirêj û hevkariya bi Rûsiya û aliyên din re pêk hatin. Niha jî dewleta Tirk ji bo rê li pêşketinên li herêmên Rêveberiya Xweser bigre, carke din ketiya nava tevgerên plangeriyê de, li ser wî esasî jî bazarên din ên qirêj bi Rûsiya û hikûmeta Şamê re pêk anî. Xwepêşandan û şerê niha li herêmên dagirkirî pêk hatine, ne ji ber vekirina deriyekî di navbera herêmên dagirkirî û hikûmeta Şamê de ye. Ne tenê jî di encama êrişên nijatperestiyê yên li djiî koçberên Sûriyê yên li Tirkiyê ne. Xwepêşandan û şerê li herêmên dagirkirî di encama kombûyîne dehan salan e. Gelên Sûriyê yên li herêmên dagirkirî di encama siyasetên qirêj ên dewleta Tirk ji herêmên xwe yên wekî Xwûta Şamê, Dera, Humis, Hema û Helebê hatin derxistin û li herêmên kurdan wekî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî hatin bi cihkirin. Îro jî heman koman li dijî dewleta Tirk ketine tevgerê. Gelo mirov dikare bêje komên çete yên fînaseya xwe ji Tirkiyê digirtin, hişyar bûne! Têgihiştine ku dewleta Tirk ji bo berjewendiyên xwe ew ava kirine û bi wan li her derê şer dide meşandin? Heger helwesta wan koman rast be, dibe zemînekî xweş a ber bi çareseriya aloziya Sûriyayê ava bûye. Ev tenê bi hevgirtina civakî û xwedîderketina gelê Sûriyê li hev dê pêk were. Dibe tevgera niha li herêmên dagirkirî bibe destpêka derxistina dewleta Tirk ji xaka Sûriyê be. Ev dê ji bo herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rêveberiya Xweser jî bibe derfetke zêrîn a ber bi rizgarkirina herêmên dagirkirî, di heman demê de bibe zemînekî nû ya bi destxistsina statuya siyasî ya li herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Di heman demê de bibe zemîna çareseriya demokratîk a li tevahî xaka Sûriyê. Tekane riya wê jî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Rêveberiya Xweseriya Demokratîk tekane riya çareseriyê ye. Vaye careke din nirxanin û nêrînên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê derdikevin isbat dibin. Isbat dibe ku gelê Sûriyê bêyî destwerdana aliyan wê karibe hemû aloziyên xwe yên heyî çareser bike. Ji ber destwerdanên derve alozî her diçû kûrtir dibû. Niha waye isbat dibe gel wê karibe tevahî pirsgirêkên xwe çareser bike. Bê guman wê guhertinê li herêmên dagirkirî bandorê li rewşa Siwêda, Şam, Herêmên Rêveberiya Xweser û tevahî Sûriyayê bike. Ji ber dema guhertinên mezin a di dosya Sûriyê de hatiye. Piştî 12 salan gel li tevahî herêmên Sûriyê li benda riyên çareseriya demokratîk in. Gelê tevahî herêman bê cûdahî dixwazin vegerin ser mal û milkên xwe.

# Çarçoveya têgînî...Qirkirin

**Ji remanê Rêber Apo**

Qirkirin weke dewama asîmîlasyonê ye, gel, hindikayî, her cure komên dînî, mezhebî û etnîk ên bi asîmîlasyonê nikaribin bi wan, dixwazin bi rêya fizîkî û çandî wan bi temamî tesfiye bikin û wan têk bibin. Li gorî rewşê ji herdu rêbazan yek tê tercîhkirin. Rêbaza qirkirinê bi awayekî fizîkî bi giştî bi çanda elîta serdest ango li gorî çanda dewleta netewe bi komên çandî yên di rewşa serdest de têne kirin. Mînaka tîpîk a ji bo vê yekê jenosîdên ji bo çanda Cihû û gelê wê ye. Tevahiya dîrokê Cihû hem di qada maddî de û hem jî di qada çanda manewî de beşên herî bi hêz pêkanîn û ji ber vê, li hewldanên tinekirin û derbên fizîkî yên çandên serdest ên dijber rast hatin, timûtim qirkirinên weke pogrom têne binavkirin bi serê wan de hatin.

Rêbaza duyemîn a qirkirinê ceribandinên qirkirinê yên çandî ne, û zêdetir çanda dewleta netewe û elîtên serdest li ser gel, civakên etnîk û komên baweriyê yên qels û pêşneketine tê ferzkirin. Bi qirkirina çandî ya weke mekanîzmaya bingehîn tê xebitandin armanc ew e, di nava çand û zimanê dewleta netewe û elîta serdest de bi tevahî tesfiyekirina van gelan û koman e. Di serî de saziyên perwerdeyê di nava her cure saziyên civakî de ev gel û kom têne hêran û bi vî awayî hewl didin wan tine bikin. Qirkirina çandî li gorî ya fizîkî bêhtir bi êş û jan e, cureyekî qirkirinê ye, dirêj dajo. Encamên rê li ber vedike ji ya fizîkî bi zêdetir felaket in; ji bo gel an jî civakekê felaketa herî mezin e ku di jiyanê de lê rast bê yan jî bi serî de bê. Gel an jî civak neçar têne hiştin hebûn, nasname, hemû hêmanên çanda maddî û manewî yên xwezaya wan pêk tînin biterikînin û ev bi çarmîxkirina demeke dirêj re wekhev e. Li vir, mirov ji bo nirxên çandên li ber qirima qirkirinê ne, nikare behsa jiyanê bike, belkî mirov dikare bibêje, nalenale wan e. Modernîteya kapîtalîst wexta kara herî zêde bi dest dixe, êşa esas a tevahiya gelan, çînên bindest û karkeran bi mêtina nirxên wan ên maddî nade kişandin, ji ber ku bi tevahî nirxên wan ên çandî li çarmîxê dixe êşeke kûr bi wan dide kişandin. Ji bilî çanda fermî ya dewleta netewe,



rastiya tevahiya nirxên çandî û maddî yên din candayîna di çarmîxê de ye. Jixwe wekî din, nabe ku mirovatî û hawîrdora ekolojîk bikin çavkanî û biqedînin.

Kurd di nava gelên qirkirina çandî dîtî de yê herî zêde bi encamên wê yên trajîk re rûbirûbûyî ye. Di vî warî de Kurd mînakeke balkêş in. Dewletên netewe yên serdest li ser nirxên çanda manewî û maddî ya gelê Kurd mekanîzmayeke çarmîxkirinê danîne û gelê Kurd di nava pencên vê mekanîzmayê de dinale. Di serî de nirxên gelê Kurd ên bi kedê hatin bidestxistin, bi tevahî nirxên civakî yên gelê Kurd ên civiyayî, çavkaniyên dewlemend ên binerd û sererdê bi awayekî eşkere talan dikin, yên mayî jî ji îmhayê re dihêlin, bêkar dikin, dirizînin, dikin ku kirêt bibe li rûyan neyê nêrîn û pê re jiyan nebe. Hiştine ku mîna rêyek bi tenê li pêşiya kesê Kurd be: Di nava dewleta netewe de bihele, bi tevahî ji nirxên xwe yên bingehîn biqere! Ji bilî vê rêya jiyanê nîne. Qirkirina çanda Kurdî ya car caran digihîje heta bi qirkirinên fizîkî jî belkî di serê wan mînakên herî trajîk û bi tesîr de ye ku rastiya modernîteya kapîtalîst bi her awayî eşkere nîşan dide.



# Ramanê Rêber Apo îlham da cîhanê

Hevseroka Kongreya Civakên Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê Zubeyda Zumrut diyar kir ku heta azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo pêk were wê pêngava azadiyê berdewam bike û got, "Ramanê Rêber Apo Îlham daye tevahiya cîhanê."

**Amara Bara/Qamişlo**

Kampanyayên ku di çarçoveya pêngava 'Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka Kurd re çareserî' de hatine destpêkirin, li Welatên Awrupa bê navber tên domandin. Di vê çarçoveyê de Hevseroka KCDK'ê Zubeyde Zumrut ji rojnameya me re axivî.

### Kampanya bi pêşengtiya dostên Rêber Apo destpêkir

Zubeyda diyar kir ku Kampanya Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ku di 10'ê Cotmeha 2023'an de ji aliyê dostên gelê kurd ve hatibû destpêkirin ji bo tevahiya mirovahiyê girînge û wiha got: "Ev pêngav ji bo me û ji bo tevahiya mirovahiyê pir girîng e. Azadiya fîzîkî a Rêber Apo ne tênê pirsgirêka gele kurde, lê pirsgirêka hemû cîhanê ye. Di vê pêngavê gelek dostên kurdan, rewşenbîr, fiylesof, hiqûqnas û siyasetmedar bi taybet kesayetên ku têne naskirin û sendîqa jî tê de cîh digrin. Pêngav di qonaxa yekemîn de bi kelecan û coşeke pir mezin derbasbû, dema ku standa hemlê hat diyarkirin li 74 welatan hate destpêkirin û niha jî ev hemle ji 100 welatan zêdetir belavbûye û tevlîbûneke mezin ji vê hemleyê re çêbûye, heta azadiya Rêber Apo ya fîzîkî pêk were wê hemle berdewam bike. Berê jî gelek hemle hatin destpêkirin lê dem bi dem bûn û dîrok dihatin diyarkirin. Biryara vê hemlê heta ku Rêber Apo azad bibe wê berdewam bike. Ev meşa Azadiya têkoşîna Rêber Apo ye, ji bo civakê Kurdistaniyên li Awrûpa û hemû dostên Rêber Apo di nav vê xebatê de cihê xwe digrin.



### Paraznameyên Rêber Apo ji gelê Rojhilata navîn re bû îlham

Zubeyda da xuyakirin ku xwendina paraznameyên Rêber Apo îlham da hemû cîhanê û wiha domand: "Di qonaxa dûyemîn de çalaki li ser asta welat, Awropa û herçar parçeyên KurdIstanê rojane berdewam dikin. Li Awropa her kar û xebatek li ser bingeha azadiya Rêber Apo tê kirin. Qonaxa dûyemîn coşa xwe di Newrozê, 4'ê Nîsanê û 8'ê Adarê de derxist holê, di paraznameyên Rêber Apo de û bi riya fikir û felsefeya wî ji gel û dostan re parvekirin û girêdayî vê yekê jî lêkolîn têne kirin. Bi Rêber Apo re diyalog li welatên Awropa bi xwendina pirtûkên Rêber Apo û nivîsên wî tên kirin, her çiqasî Rêber Apo li gireva îmraliyê girtîbe jî, bi rêka diyalogan bi Rêber Apo re jiyan dikin, li ser vê bingehê pirtûkên Rêber Apo û paraznameyên wî di 22'ê Pûşberê bi dawî bûn, lê dem bi dem bi dostan re pilansazî têne kirin ku hertim wê berdewam bike."



### Tevgera Jin a AwrOpa 1300 îmze ji CPT'ê re şandin

Zubeyda balkişand ser nameyên ku ji CPT'ê yê re hatinê şandin û wiha got "1300 nameyên ku hatine îmzekirin, ji CPT'ê re hatin şandin. Li Baselê jinan ji bo azadiya Rêberê Abdullah Ocalan, 1300 name ji CPT'ê re şandin. Kampanyayên ku di çarçoveya pêngava 'Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareserî' de hatine destpêkirin, li welatên Awropa bê navber berdewam dikin. Di çarçoveya pêngavê de Tevgera Jinên Kurd a Ewropayê (TJK-E) ji bo ku CPT berpirsyartiya xwe bi cih bîne, kampanyaya nameyan da destpêkirin. Îro jî kampanya li bajarê Baselê yê Swîsreyê hate birêvebirin û bi hezaran nameyên ku li bajarên Lozan, Sîon, Zurîh, Cenevre û Aaraûyê hatine komkirin ji CPT'ê re hatin şandin."

### CPT bi erka xwe ranabe

Zubeyda Zumrut diyar kir ku gelê Kurd û dostên wan ji bo ku CPT wezîfeya xwe bi cih bîne, bi salane bê navber kampanyayan dimeşînin û wiha got: "Weke Kurdistaniyên ku li Baselê dijîn, em di çarçoveya kampanyayê de îro ji CPT'ê re name dişînin û car din dixwazin wezîfeya CPT'ê li bîr bixin. Îro li dijî Rêbertiya me pêkanîneke dijmirovî heye. CPT mîna duh, îro jî bêdengiya xwe didomîne. Em ji vir careke din bi bîr dixin ku em vê helwesta CPT'qebûl nakin. Heta ku Rêbertiya me azad dibe, weke jinên Kurd em ê çalakiyên xwe li her qadê bidomînin."

## 2 dijmin û 2 xayînên dişibin hev



**Farûk Sakik**

Di dîroka Kurdistanê ya sedsalên dawî de 2 serdemên girîng û dişibin hev hene. Serdema navbera salên 1919- 1923'yan û serdema salên 2002-2024'an. Di van 2 serdeman de 2 kesayet hene. Ataturk û Erdogan.

1-Ataturk

Ataturk di sala 1919'an de dema ku axa welatê wan di navbera hêzên rojavayî de, bi peymana Sewrê dihat dabeşkirin, xwe avêt bextê Kurdan. Kurd, şervan bûn, leheng bûn, hêvî bûn.

Herdû gel bi hev re li dijî wan hêzên ku axa Anatolya parve kirine re şer kirin. Di vî şerî de encam girtin. Lê astengiyeke din li pêşiya wan hebû. Peymana Lozanê. Bi vê peymanê dixwestin sînorê xwe mîsoger bikin. Lê bê Kurdan jî nedibû. Dema di sala 1920'î de meclîs ava kirin, nûnerên Kurdan jî li vê meclisê hebûn. Di destûra bingehîn a sala 1921'ê de mafê 2 gelan wek hev bû. Ataturk di axaftinên xwe de behsa muxtariyet-rêveberiyên xweser dikir. Ev yek hemû ji bo di Lozanê de destkeftiyên mezin bi dest bixin dihatin gotin. Lê piştî Lozanê red-înkar-asîmîlasyon dane destpêkirin. Serhildana Şêx Saîd dest pê kir. 47 kes hatin îdamkirin. Roj: 29'ê Hezîrana 1925'an bû. Piştî serhildanê, pîlana qirkirina Kurdan a ku ji berê de veşartî amadekiribûn xistin meriyetê.

2-Erdogan:

Di sala 2002'yan de li Tirkiyê kesek bi navê Erdogan li Tirkiyê bû desthilatdar. Salên 1919 û 1923'yan ji xwe re emsal girt. Çawa wê demê di tengasiyê de bûn xwe spartibûn Kurdan. Di van salan de jî rewşa Tirkiyê nebaş bû. Erdogan jî ji doza Kurdistan dest pê kir. Gelek soz dan Kurdan. Di destpêkê de, Kurdan, ev yek dîtin ku hin argumanên binê wî vala ne û di pratîkê de jî yek gav nayê avêtin, dîsa şer dane destpêkirin. Hemleya 1'ê Hezîrana 2004'an dane destpêkirin.

Roj hat xwe spart Rêber Apo û di sala 2013'an de muzakereyên hetanî sala 2015'an dest pê kir.

Wî jî wek Ataturk heman peyv li meclisa Tirkiyê bi kar anî. Digot: Dewletê li Dêrsimê qetlîam pêk aniye. Hûn çima dibêjin Kurdistan tune? Aha, di arşîvên meclisê de gelek caran peyva Kurdistan hat bikaranîn. Çima ev axftin dikir? Wek Ataturk ew jî di tengasiyê de bû. Şerê wan û cemaetê yê navxweyî dest pê kiribû. Dewleta kûr xwe komî serhev kiribû û li her deverê êrîş dikir. Desthilatdariya wî di bin talûkeyeke mezin de bû.

Ji ber van yekan, ji bo ku nefesek bigire, desthilata xwe bidomîne, li Îmraliyê, ji Rêber Apo alîkarî xwest. Rêber Apo xwest şansek bide her du gelan. Dixwest bi nexşerêyek pêşî li siyaseta demokratîk veke û dest bi hevdîtinan kir.

Dema ku ev hevdîtin dewam dikirin, li aliyek jî wek serdema Ataturk amadekariya plana qirkirina Kurdan dihat kirin.(Civîna MGK'a Cotmeha 2014'an). Lê dema dîtin bi dekûdolaban nikarin li hemberî Rêber Apo û Kurdan encam bigirin rûyê xwe yên veşartî eşkere kirin. Şer dane destpêkirin-2015. Şerê ku îroj li Başûrê Kurdistan diqewime, ji wê demê ve hetanî roja me dewam dike. Ew piştgiriya ku PDK'ê îroj dide dewleta Tirk, ji wê demê ve dest pê kiriye.

Herkesî digot armanca Tirkiyê, tunekirina tevgera azadiyê nîne. Armanc dagirkirina Başûrê Kurdistan û ji wê derê jî ber bi Mûsilê birêketine. Wê demê bawer nekirin. Aha îroj êdî bi awayekî eşkere li hember Medya, tu tiştek venaşêrin û qontrola nasnameyên gel dikin. Gefên valakirina gundan dixwin. Zeviyan dişewitînin. Hejmara baregehên xwe zêde dikin. Li çend girê Kurdistanê alaya xwe berz dikin. Di dema Şêx Saîd te heger Bînbaşî Qasim nebûya, heger hin şêx û serokeşîrên wek PDK ya îroj piştgirî nedana dijmin belkî îroj Kurdistan azad bû.

Ataturk û Erdogan dişibiyan hev, lê Qasim Beg û PDK'ê jî dişibin hev.

## Erdogan kolandina gora Kurdan didomîne



**Zekî Bedran**

Di asta kelêcankirina temaşevanan re geşêdanên li Rojhilata Navîn ewqasî bi tevgerin. Dawiya nakokî, pevçûn û lêgerînan naye. Rojhilata Navîn eşkere veguheriye topa nakokî û pevçûnê. Lê kesên ku dîroka herêmê dizanin dibêjin ku du pirsgirêkên sereke yên herêmê di van pevçûnan de roleke bi bandor lîstine. Di pirsgirêka sereke de pirsgirêka Filistîn û Kurdistanê tê. Kurdistan piştî Şerê Cîhanê yê Yekem di nav çar dewletan de hat parvekirin. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem dewleta Îsraîl avakirin û Filistînî bi giranî ji axa wan derxistin. Helbet ev rewşa li Filistîn û Kurdistanê bi alîkarî û piştgirîya hêzên emperyalîst pêk hatiye.

Tirkiye weke yekemîn dewleta ku netew dewlet hatiye avakirin, di tinekirin û helandina gelê Kurd de pêşengtî kir. Ev modêla Tirkiyeyê piştre ji aliyê Îran, Iraq û Sûriyeyê ve hat pejirandin. Van her çar dewletan her tim li ser Kurdan hevparîbûne û di tunekirina Kurdan de wek ku dixwazin tevdigeriyane. Statuya Kurdistanê an jî ya rast bê statubûn hiştina wê, bûye sîstema cîhanê. Bi taybet piştî ku Tirkiye ket nav NATO yê, ev rewşa bêstatûyê gav bi gav kûrtir bû.

Tirkiye ji bo Kurdan bêstatu bihêle li herêmê û cîhanê rola herî bibandor dilîze. Di sala 2011'an de dema li Sûriyeyê xwepêşandan dest pê kirin, rêveberiya Erdogan yekser sînorên xwe vekir û ji bo hilweşandina rêveberiya Beşar Esad ket nav tevgerê. Sedema wê tevgera wî dîsa Kurd in. Wî texmîn dikir ku dê desthilatdariya Beşar hilweşe. Wê demê bi nêrîna dibe ku Kurd ji vê rewşê sûd werbigrin û statûyek bidest bixin dijî vê pozîsyonek girtin. Erdogan wiha difikirî ku ji xwe Beşar nikare li ber xwe bide, dibe ku wek Qedafî û yên din here. Yanî digot, "Ez dikarim bi kevirekî zêdetir çûkan bikujim." Bi piştgirîkirina Îxwanan re li ser Sûriyeyê dê bandoreke mezin bikira û li Rojhilata Navîn jî xwedî bandor be. Xewnên Împaratoriya Osmanî dikirin û hesabên berfirehkirinê çêdikir. Ji firsendan dixwest sûd werbigre.

Lê belê, hesabên wan bi ser neketin. Hem Kurdan hem jî rêveberiya Beşar li ber xwe dan. Kurdan DAIŞ`ê binxistin. Bi hevpeymaniya navdewletî re DAIŞ têk bir. Rêveberiya Beşar jî bi piştgiriya Îran û Rûsyayê li ser lingan ma. Lê belê hesabên Erdogan Sûriye ber bi geravek bi xwîn ve kişand. Bi sed hezaran mirovan jiyana xwe ji dest da û bi milyonan neçar man ku koç bibin. Sûriye jî wekî welatekî bi giranî birîndar hîn jî êşên vê dikişîne. Li aliyê din Erdogan bi hevkarê xwe yê nijadperest MHP'ê re wêraniyê birxêstin û plan dike.

Piştî ku planên Erdogan bi ser neketin, di gelek mijaran de paş vegeriya. Parektiyê li Îsraîlkir û kete ber lingên welatên Ereban. Lê dev ji dijminatî û êrîşên li hember Kurdan berneda. Dîsa bazarên xwe bi DYA û hêzên Ewropayê re li ser Kurdan meşand. Têkiliyên wan bi Rûsyayê re jî wiha ne. Bi kurtasî li ser dijminatiya Kurdan bi hemû cîhanê re danûstandinan dike û hewl dide piştgiriyê werbigire.

Ev demekê Erdogan digot ku ew dixwazin bi Sûriyeyê re têkiliyên xwe asayî bikin. Ji bo vê Rûsyayê xist nava tevgerê. Rêvebiriya Pûtîn jî ji şer û ambargoya ku tê de bûn zehmetiyê dikişand. Di dagirkirina Efrînê de beriya niha bi Tirkêyeyê re hevkarî kiribû. Ji bo berjewendiyên xwe gel çewisandin û ji bo xwe wan pêşkêş dikirin. Tevî hemû hewldanên Rûsyayê jî B. Esat bi Erdogan re hevdîtin nekir. Bi awayekî mafdar digot, ger ez pê re rûnim, ez ê dagirkeriya wan li Sûriyê bipejirînim. Ji bo hevdîtinê yekemîn şertê wî ew bû ku leşkerên xwe ji Sûriyê vekişînin. Lê belê, daxuyaniya wî ya dawî cuda bû. Ev daxuyanî piştî serdana nûnerê taybet ê Pûtîn bo Şamê da. Wî got ku ew dikarin pêwendiyên xwe bi Tirkiyê re asayî bikin.

Sûriyeyê çima helwesta xwe guhert? Ev mijareke girîng e ku hewceyî nîqaşê ye. Pêdivî bi çavdêrî û lêkolînê heye. Di nêzîk de hilbijartinên DYE hene. Îhtîmala Trump heye ku ji nû ve were hilbijartin. Ger wisa be, dibe ku Amerîka ji Sûriyeyê vekişe. Di vê rewşê de Tirkiye wek dagirker tenê dimîne. Tirkiye di rastî de naxwaze Amerîka ji Sûriyeyê derbikeve. Hemû zextên Erdogan û rexneyên li DYA`yê tenê li ser Kurdan e. Heta ku DYE li wir be, qirkirin û belavkirina Kurdan bi demê re belav dibe.

Konjonktur diguhere û dibe ku ji bo Kurdan statuyek derkeve holê. Ji DYA'yê re dibêje: `Dev ji YPG'ê û QSD'ê berde û daxwazên tê ezê bikim. Ger DYA derkeve emê Kurdan bişkînin, lê wê demê jî ez nikarim li Sûriyeyê bimînim. Her ku Sûriye bihêz bibe, wê neteweperestiya Ereban tehrîk bike û ezê nikaribim li wir bimînim.` Di hesabê, `ez nikarim mîna niha Îdlib û El Nûsra û hwd. biparêzim` de ye. Tevî ku di firotina van hêzan de tu pirsgirêka wî tine ye. Di dawiyê de bi ser nekeve dê wan jî bifiroşe û ji Sûriyeyê derbikeve. Derdê wî yê sereke tunekirina Kurdan û guhertina demografiye di sînorê xwe de pêk bînê ye.

Beşar Esat çima zimanê xwe guhert? Helwesta wî jî bi van geşedanan ve girêdayî ye. Ger Amerîka vekişe, dagirkirina herêmên Kurdan bi Tirkiyê re dê hesantir bibe. Ez ê dest deynim ser herêmên petrolê û hwd. Wiha hesap dike, `piştî ku karê Kurdan li herêmê bi dawî bû em ê bi peymana dagirkerên Tirk re ti zehmetiyan nebînin.` Xuya ye ku dê li herêmê tevgerên nû çêbibin!